# Efrîn di bin dagîrkeriyê de (318):

## Kuştina sivîlekî, dijayetiya li ser sivîlan, kêmbûna vegera anîndeyan, dizîn, vêrgî û şewitandina makînakê

Ji nû ve em dubare dikin ku Dagîrkeriya Turkiyê hîn berdewam e, walî di "Avahiya Serê ya Kevin" de hîn karê xwe dike, û Ala Turkiyê li ser hildayî ye, bi ser de jî hebûna biryargehên leşkerî, ewlekarî û istîxbaratî yên Turkî, û herweha jî piraniya Milîseyên "Artêşa Niştîmanî ya Sûrî/berê" biryargehên xwe yên leşkerî û nivîsgehên xwe yên ewlekariyê û abortiyê bi dest de ne, binpêkirinan pêk tînin, gefan li xelkê dikin, vêrgiyan li wan dixin û malmewdanên wan didizin; Û bi ser ku Amûra "Ewleya Giştî" destêwerdanan di hin dozan de dike, qurbaniyên binpêkirinan ji tirsa ku rastî kiryarên pîstir netên, giliyan pêşkêşî wê nakin!

**Ev jî hin bûyînên li ser rewşên serwerkirî ne:**

**= Kuştina sivîlekî:**

Li 03.03.2025an. Z, Hemwelatî "**Hemîd Ehmed Hesen** /60/sal" ji xelkê Gundê "Aqûbê" - Şêrewa jiyana xwe ji dest da, û birayê wî jî birîndar bû, dema ku wî li nav zeviya zeytûna ya xwe (ya li Rojavayê "Aqûbê" bi aliyê Gundê "Basilê" ve) pêle bombeyeke zemînî ji bermayên şer kir û teqiya.




**= Dijayetiya li ser sivîlan:**

**-** Li 03.03.2025an. Z, li ser riya çûndina Çiyayê "Hawarê" ji bo anîna êzingan, piştî ku hemwelatiyê perîşan "**Rizgar Menan Me'imo** /41/sal" ji xelkê Gundê "Hesendêra" - Navça Bilbilê hewilda ku du kûçikan û ciwanekí nûgihayî ji êrişa li ser kûçikê xwe bi dûrxîne, diya lêwik deng li mêrê xwe kir, û ew jî hat û êrişî "Rizgêr" kir û yekser bi çoyekî hesinî li serê wî xist, di encamê de "Rizgar" mekin birîndar bû, û ji ber wê pêdivî çêbû ku xelkê gund wî rakin dermankirinxaneya/mistewsefa "Meydankê" û paşê jî Nexweşxaneyeke "Efrînê", û diyar bû ku xwîndarivandinek di seriyê wî de heye, û herweha jî Şikestinek/tîkek di qafê wî de; Were zanîn ku yê dijayetî kiriye bi "**Xewar**" tê navdan û di salên pêncî de ye, bi aliyekî nediyar ve reviya, ew ji anîndeyên di konên Rojavayî gund de rûniştiye, şivanê pêz e, û yekî şerûd e û ji berê de dijayetiya xelkê dike.



**-** Ji berî fitara roja 10.03.2025an. Z, wexta Hemwelatî "**Nîdal Sebrî Şindî** /48/sal" ji xelkê Gundê "Dumiliya" - Navça Reco rabû dîkana xwe ya cilan/kincan a di avahiya "Ebara" de (ya li orta Bajarê Efrînê) bigire, du çekdaran êrişî wî kir û çend kêr li lingên wî xistin, ji ber wê ew mekin birîndar bû, û ji ber wê ew rakirin nexweşxaneke Efrînê, û herdu dijker jî kanîn bireviyana; Û ew dijayetiya jî pêkhat, ji ber ku ew razî nebû ku cilan bi dên/bênextî bifroşe wan.




**-** Li Gundê "**Ebodanê**": Li gor bûyerên li ser erdê çêdibin xuya dibe ku Milîseya "Artêşa/Ceyş El'nuxbe" ya ku "**Mu'itez Reslan**" serkêşiya wê dike ji biryara helandina xwe û tevlêbûna Wezareta/Şlayariya Berevaniyê ne razî ye, û ta niha hêz û biryargehên wê weke berê ne, û malbatên çekdarên wê û malbatên jê ve nêzîk ji gundên di bin desteseriya wê de ("Emara, Şêxûtka" - Navça Mabeta, "Zêtûnakê, Omersimo, Şêxorzê, Heftaro, Se'irîncekê, Elîcara, Diraqliya, Ebodanê" - Navça Bilbilê...) neçûne/barnekirine, û ew ji lihevkirina ku di nav Serok "Ehmed El'şer'i" û Ceneral "Mezlûm Ebdî" îmzekirî de ne razî ye/acize, û hema li roja din ji lihevkirinê 11.03.2025an. Z endamên wê û endamên malbatên wan li Gundê "Ebodanê" dest bi sixêf û gefan li dijî Kurdan kirin, û piştî ku gopêyeke ku zarokin ji xelkê gund pê dilîstin kete maleke ku malbateke anîndeyan tê de rûdine, Milîseya "El'nuxbe" di cî de destêwerdan kir, mala Hemwelatî "**Mehmûd Eslan Seydo** /40/sal" basmîş kir, qurşîn bi banî de avêtin, "**Mehmûd**" û kurê wî yê negihayî "Eslan" (ên xwe di odakê de veşartibûn) girtin, û mekin li wan xistin, ta ku "Amûra Ewleya/Asayêşa Giştî" destêwerdan kir û ew berdan.




Lê gef û tengasiyên li ser xelkê berdewam kirin, vêca mêrên gund û hin jinên wê neçar bûn herin Efrînê û hinde giliyan pêşkêşî rêvebiriya "Ewlekariya Giştî" bikin, û wê jî gereke/giropek ji endamên xwe şand gund, û rabû "**Semîr û Besam Rehal**/ên ji Gundewarê Humsê" berpirsiyarên gund ji "El'nuxbe" girtin, û dest danîn ser çekên li ba wan, da ku bi rêjeyî heyam li gund aram û hêdî bibe.

Herweha jî li vê dawiyê Milîseya "El'nuxbe" Hemwelatî "**Mustefa Cimo**" ji ajotina zeviyeke zeytûna ye wî (ji /100/darî pêk tê) qedexe kir, ji ber ku ew komirê di nav de çêdike, û berê jî ji sala 2018an. Z ve wê dest danîbû ser werzên/mûsimên zeviyê, û weha jî li ser du malên tê de avakirî (yên herdu keçên "Cimo" yên tevî malbatên xwe zorane koçberbûyî).

Tê bîranîn ku Gundê "Ebodanê" ji dora/150/malbatên Kurd pêkdihat, piştî dagîrkirinê -sala 2018an. Z- tenê jê /50/malbat ma, û malbatên din jî ta niha nikanîn vegerinê, û /150/malbatên anîndeyan tê de hatin niştecîkirin.

**= Dizîn:**

**-** Li gor jêdereke xwecihî, Milîseyên "Firqit El'sultan Silêman Şah - **El'emşat/Tîpa/El'firqe /62/**di nav Wezareta Berevaniyê de" ya ku "Mihemed El'casêm" serkêşiya wê dike, ji herêmên "Berava Sûrî" gelek malmewdanên xelkê wê dizîn; Wan du makîneyên baran ên bi alav û amûrên elektirîkê yên malan barkirî û herweha jî makîne û çêl gihandin Bajaroka Şiyê li Efrînê û wan pêşberî firotinê dikin, lê me nikanî hejmara wan tiştan zanîba.

**-** Li Bajaroka Meydankê, li 11.03.2025an. Z, du çekdarên li ser matorê rabûn çek kişandin Hemwelatî "**Mehmûd Mihemed Ebid El'rehman** /61/sal", li dema hebûna li nav zeviyeke xwe ye zeytûna li Rojavayê bajarokê, û dest û lingên wî girêdan û xistin makînak wî ya cîp "Santafê S.M" rengreş, û piştî meşeke kin ew avêtin kenarê rê, û makîne û /900/Dolar Emrîkî û tevî belgeyên wî yên kesyetî û yên makînê dizîn; Û "Mehmûd" giliyek pêşkêşî "Ewleya Giştî" li navenda Navça "Şera" û li Bajarê Efrînê kir.

**-** Li Gundê "**Omersimo**" li Navça Şera ‹êvara 14.03.2025. Z, çekdarine ji Milîseya "Ceyş El'nuxbe" rabûn /6/tenke zêtê zeytûna (heryek/16/KG sade) û amûrine entirnêtê ji mala Hemwelatî "**Fewzî Henan Umer**" li dema serdana malbata wî ji malbateke din re dizîn; Û Hemwelatî "**Osman Reşîd**" tibabeke ji Dolarên Emrîkî da "**Ebo Ewed**" berpirsiyarê gund ji "El'nuxbe" beramberî radestbûna mal û zeviyene zeytûnê yên xwe, û ta niha /3/malbat ji xelkê gund ên ji şeş heyvan ve vegerîne herêmê li benda valakirina malên xwe ne, ji yên dest danîne ser ji sala 2018an. Z ve, û herweha jî radestbûna wan tevî malmewdanên din.

**= Binpêkirine din:**

**-** Ji dora heyvekê ve, "**Ebo Hisên**" tevî du çekdarên din ji endamên Milîseyên "Tîpa/Firqit El'hemzat" gefan li her yekî ku bi mebesta ajotinê yan şaxkirinê yan jî karine din dere nav zeviyeke zeytûna (li cîgeha hilkirin û çêkirina keviran ya di navbera herdu Gundên "Hesendêra - N. Bilbilê, û Şorbe - N. Mabeta" dixe û tibabine diravî bi zorê jê dibe; Piştî ku tuhmetine çêkirî bi wî ve dizeliqîne, yan jî çekekê dixe nav zeviyê wî da ku pê were tewanbarkirin.

**-** Li 10.03.2025an. Z, li Gundê "Çeqelê Ortê" - N. Şiyê, yê ku Milîseyên "Firqit El'sultan Silêman Şah - El'emşat" li ser desteser dikin, agir bi makînak salon "Van" e Hemwelatî "**Elî Şêx Zênel/Elî Xeçê**" hate xistin, û li gor jêdereke ji gund, ew dizane kê ji anîndeyan -ên xwe bi "El'emşat" mekin dikin- ew kar kiriye, lê ew newêre di lêkolînên bûyerê de bibêje, ji tirsa dijatiyin din re.

**Danîna rêgir û kendan/bendan li pêş vegera Koçberên Efrînê bo cî û warên wan, û milmilandina di radestkirina mal û malmewdanên wan de, û herweha jî kêmbûna vegera yên hatine niştecîkirin bo herêmên xwe yên resen, berevajîkirinên bi robet ji zagona navdewletî ya mirovahî re çêdikin, hêminiya rewşan di Sûriyê de bi giştî kend/bend dikin.**

15.03.2025. Z – 2636. K

**Nivîsgeha ragihandinê- Efrîn**

**Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê**

--------------------------

**Wêne:**

- Pakrewan "Hemîd Ehmed Hesen".
- "Rizgar Menan Me'imo" yê dijayetî li ser hatiye kirin.
- "Nîdal Sebrî Şindî" yê dijayetî li ser hatiye kirin.
- "Mu'itez Reslan" serkêşê Milîseya "Cyeş/Artêşa El'nuxbe".

--------------------------------------------